

Jinavêçûna Hin Bîr, Bawerî û Agahîyên Dîrokî yên Kurmancên Xerzan ji ber Windabûna Efsaneyên Wan

Dr. Ayhan YILDIZ

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü- Mardin Artuklu Üniversitesi/ Türkiye

Kurte

Li herêma Xerzan digel ku gelek efsaneyên zindî hene jî, bi guherîna mercên civakî ra her ku dem pê dikeve, hejmara efsanevegêran kêmtir dibe û hinek ji wan jî nav hafizeya giştî ya civakê wînda dibin diçin. Di vê qadê da çawa ku xebatên berhevkarîyê li vê herêmê kêmtir in, vekolînên zanistî jî hindik in. Lewra haya zanyarên qadê baş ji efsaneyên vê herêmê tune ye û bala wan neçûye ser taybetmendîyên wan. Wisa xuya ye ku ev qad hatîye îhmalkirin û valahîyek tê da heye. Hindek derdor hene ku ji vê valahî û îhmalkarîyê sûd werdigirin û efsaneyên vê herêmê bi awayekî neetîk berhev dikin û wekî ku ne malê edebîyata gel a Kurdî be, ji xwe ra dikin mal. Ji ber van sedemên problematîk, me wekî hincet pêwîst dît ku di vê mijarê da dest bi vekolîneke akademîk bikin. Lewra me ev rewşa bixetere, nenaskirî û îhmalkirî ya efsaneyên vê herêmê, wekî problema vekolînê li qelem da. Bi armanca ku em taybetmendî û qewareya efsaneyên herêmê tesbît bikin, cihê wan ê di bîr û bawerîya gelê herêmê da diyar bikin, li gor rêbazên zanistî polînkirina wan pêk biênin û resenîya wan nîşanî cîhana zanistê bidin, me dest bi vê vekolînê kir. Ji bo vê jî, serê pêşî me lîteratura giştî ya xebatên neteweyên Dunyayê û xebatên Kurdî ku têkildarî qada efsaneyan e xwend û ew nirxand. Peyra me unîversaya vê xebatê, bi efsaneyên Kurmancîya Jorîn ên Rojavayê herêma Xerzan tixûbdar kir û ji populasyona deverê, bi awayekî akademîk ji devê vegêrên herêmê, wekî daneyên vekolînê efsane berhev kirin. Me ev efsaneyên berhevkirî li gor rêbaza giştî ya neteweyên dunyayê polîn kirin, di pey merheleya vedîtinan da analîza wan kir, alîyên wan ên ku bîr, bawerî, dîrok û çanda Kurdan dîteyîsandin nikirand û em gihaştin beşa encamê. Di pêvajoya vekolînê da diyar bû ku zanyarên dunyayê di pey vekolînên ferdî da, di navbera sala 1959an û 1969an li ser mijara efsaneyan şeş rêzekogre li dar xistine, di Kongreya Budapeşteyê da zanyaran li ser polînkirineke hevbeş a navneteweyî ya efsaneyan li hev kirîye û di vê biwarê da biryarên hevpar dane. Herçendî vekoleran ji hin herêmên Kurmancîya Jorîn hin metnên efsaneyan li gor rêbaza zanistî berhev kirine û li ser wan analîz kirine jî, efsaneyên ku ji vê herêmê hatine berhevkirin hindik in û li ser efsaneyên herêma Xerzan xebatên zanistî kêmtir hatine kirin. Bi ser van da jî hinek derdoran vekoler, ji efsaneyên vê herêmê, bi neheqî hinek kirine malê xwe û ji ber wefata hin vegêran, hinek jê wînda bûne. Digel van jî li herêma Xerzan hin jî vegêrên

efsaneyan hene. Li gor van komên polînkirî yên efsaneyan, hinek jê têkildarî dîrokê ne, hinek têkildarî bîr û bawerî û mexlûqên dersiruştî ne. Di efsaneyên herêma Xerzan da mirov rastî bîr, bawerî, dîrok û çanda gelê Kurd tê. Bi windabûna efsaneyan ra

hin bîr û bawerîyên têkildarî dinyayê, agahîyên dîrokî û çandî yên civaka Kurmancan jî ji holê rabûne û hafizeya civakî ya herêmê zerar dîtîye.

peyvên Sereke: *Efsane, Polên Efsaneyan, Bîr û Bawerîyê Di Efsaneyan Da, Efsaneyên Kurmancîya Jorîn, Efsaneyên Xerzan.*

Destpêk

Gelek efsaneyên zindî li ser cihên cografîk, avahîyên mîmarî, şexsîyetên şêxî û awayê çêbûna heywanan li herêma Xerzan hene. Çi feyde ku ji ber mercên zehmet ên civakî êdî hêdî hêdî vegêr û guhdarên wan kêr dibin. Her ku dem bi ser civakê ra derbas dibe, hejmara efsanevegêran kêr dibe û gelek metnên efsaneyan ji nav hafizeya giştî ya civakê winda dibin diçin. Bi ser van da jî, çawa ku xebatên berhevkarîyê li vê herêmê kêr in, vekolînên zanistî yên li ser efsaneyên wê jî hindik in. Îca haya zanyarên folklorê yên dunyayê jî, ji ber ku bi awayekî baş ji efsaneyên vê herêmê li ber destê wan tune, bivê nevwê bala wan neçûye ser taybetmendîyên wan ên xweser. Nexwe wisa xuya ye ku ev qad hatîye îhmalkirin û valahîyeke mezin di vê qadê da maye. Di vê rewşê da hindê kesên derdor ji vê valahî û îhmalkarîyê sûd wergirtîye û efsaneyên vê herêmê berhev kirine û bi awayekî neetîk ew wekî ku ne malê edebîyata gel a Kurdî be, wergerandine zimanê xwe û daxilî nav cîhana folklorê kirine. Ji ber van sedemên problematîk, me jî ev yek wekî hinceteke xebatê dît û di vê mijarê da me dest bi vê vekolîna akademîk kir.

Ji ber ku metnên efsaneyan wekî çavkanîya hafizeya civakî di jîyana gel da cih digirin û bi windabûna wan ra zerar digihîje bîra giştî ya civaka herêmê, bivê nevwê zerar digihîje bîra giştî ya civaka Kurd gişt jî. Ev ku heye, çawa ku wekî rasteqîneyekê li pêşberî me ye, di heman gavê da wekî pîrsgirêkekê jî derdikeve pêşîya me. Lewra me ev yek wekî problema vekolînê hîlbijart û hewl da ku wekî rêyeke çareserîya wê, efsaneyên vê herêmê berhev bikin û analîza wan a têkildarî bîra civakî pêk biênin. Ji bo vê jî me ev pîrsên eslî yên têkildarî pîrsgirêka vekolînê dîyar kirin û em bi pey vebersivîna wan ketin:

“Gelo rewşa efsaneyên ku li herêma Xerzan di nav gel da hebûne çawa ye? Çanda derbirîna efsaneyan li vê herêmê di çi merheleyê da ye? Li gor polînkirina efsaneyan bi giştî çi cure efsane li vê herêmê hene? Efsaneyên vê herêmê bi kîjan alîyên bîra civakî ve peywendîdar in? Çi cure bawerî û çanda Kurdan teyîsîye ser efsaneyên vê herêmê?”

Heke em karibin bersiva van pîrsan bidin û bigihîjin encameke baş a zanistî, dê hin metnên orîjînal ên efsaneyên Kurmancî ji windabûnê bihên rizgarkirin, bi vî awayî bivê nevwê dê feydeyeke ve vekolînê bigihîje qada giştî ya mijarê û dane û encamên wê jî, helbet bi kêrî vekolînên nû bên. Herwiha ew qenaet bi me ra çêdibe ku vekolerên vê qadê yên dunyayê jî, dê ji encamên ve vekolînê sûd wergirin. Bi ser da jî hêvî çêdibe ku çanda efsanebêjîyê, di jîyana rojane ya gel da zindî bihê hiştin û civak, hîn zêdetir pûte bide wan. Bi vî awayî dibe ku hem cîhana giştî ya welat û derveyê welat efsaneyên Kurmancî jî nas bikin û li wê gorîyê nêzî çand, dîrok û folklorê Kurdan bibin.

Li ser vê terz û teherê me tixûbên unîversa û populasyona xebatê jî, wekî Bakurê Rojavayê Xerzan dîyar kir. Ji ber ku derfetên maddî, demî û taqetî têr nedikir,

me alîyên din ên herêma Xerzan li derveyî unîversaya xebatê hiştin. Lewra me bi efsaneyên Kurmancîya Jorîn ên Bakur-Rojavayê herêma Xerzan tixûbdar kir û me hem ji populasîyona deverê, bi awayekî akademîk ji devê vegêrên herêmê, wekî daneyên vekolînê efsane berhev kirin, hem jî ji xebatên ku berî me hatibûn kirin jî sûd wergirt. Me ev efsaneyên berhevkirî li gor rêbaza giştî ya neteweyên dunyayê polîn kirin, di pey merheleya vedîtinan da analîza wan kir, alîyên wan ên ku bîr, bawerî, dîrok û çanda Kurdistan dîteyîsandin nikirand û em gihaştin beşa encamê.

Berî ku em bikevin nav hurgilîya mijarê, ji ber metodolojîya zanistî me pêwîst dît ku geryanek li nav xebatên vê qadê yên ku berê hatine kirin pêk biênin. Li ser vê bingehê, bi mebesta ku em bersiva van pirsên jorîn bibînin, serê pêşî me ji lîteratura nivîskî ya têkildarî qada giştî ya efsaneyan xwend, nirxand û ji wan mifa wergirt. Peyra me berê xwe da unîversaya xebatê ku Rojavayê Herêma Xerzan, me hinek ji efsaneyên li ser cih û warên siruştî, riwek, cih û avahîyên mîmarî, hebûnên derasayî û kesayetîyên dînî, wekî daneyên mînak ên vekolînê ji populasîyona herêmê, bi awayekî akdemîk berhev kirin. Ji ber ku em şênîyên herêmê bûn, jixwe me hinek ji wan hîn berî bîst salî ji devê çavkanîyên zindî yên derdora xwe berhev kiribûn, piştra me hinekî din jî, ji çavkanîyên zindî û hinek jî ji çavkanîyên nivîskî jî berhev kirin ew li gor metoda zanistî ya gelnasîyê bi rêk û pêk kirin û me hilda milê xwe ku li gor rêbaz û teorîya fonksîyonî ya folklorê wan analîz bikin. Wekî rêbaz, berî ku em bikevin nav kûranîya mijarê, divê em bi xwendin û nirxandina lîteratura têkildarî qada vê vekolînê dest pê bikin û peyra bi taybetî bihên ser mijara xwe ya eslî.

Lîteratura Qadê

Di beşa danasîna lîteraturê da em dê berê bala xwe bidin ser xebatên ku vekolerên dunyayê li ser qada efsaneyan kirine. Serê pêşî em dê dor bidin xebatên ku li Kafkas û Rojava li ser efsaneyên Kurmancî hatine kirin, peyra yên li cîhana Îslamî û dawî jî yên ku li ser efsaneyên Kurmancî hatine kirin. Em dê vê xwendin û nirxandinê, li gor rêza wan a dîrokî, ji mijara giştî ya qadê, ber bi qada taybet a mijara vekolînê ve bikin.

Geryarên Îngilîz yên mîna John Macdonald Kinneir ((1818), James Silk Buckingham (1829), J. Shel (1836), Claudius James (1836), George Percy Badger (1852) û Austin Henry Layard (1897) di nivîsên xwe yên gernameyî da cih dane efsaneyên têkildarî cihên siruştî yên cografîk û mîmarî û kesayetîyên dînî yên herêma Serhed, Mêrdîn, Behdînan û Hekarîyê (Tarduş, 2022, pp. 134-136).

Andranîk (1888) ger û rêwîtiya xwe ya Dêrsimê kirîye pirtûk û Têmûrê Xelîl ew ji zimanî Ermenîkîya Berê wergerandîye Kurmancî û bi navê *Dêrsim, Rêwîti û Erdnîgarî* çap kirîye. Wî di vê pirtûkê da cih daye hinek efsaneyên vê herêmê (Andranîk, 2009, p. 120).

Î. A. Orbelî (1912) gera xwe ya Miksê bi zimanê Rûsî nivîsiye û kirîye pirtûk. Têmûrê Xelîl ew ji vî zimanî wergerandîye Kurmancî û navê *Li Muksê Folklor û Jîyana Rojane* lê danîye û çap kirîye. Di vê pirtûkê da geryar, hinek efsaneyên Kurdistan ên vê navçeyê bi cih kirine (Orbelî, 2011, p. 50).

Roger Lescot (1941) çar efsaneyên Kurmancî wergerandine zimanê Frensî û bi navê “La Légende de Mir Mohammad” di kovara *Hawarê* da weşandine (Lescot, 1941,

p. 737). Bazil Nikitin (1943) di pirtûka xwe ya *Kürtler* da cih daye hin efsaneyên Kurdan (Nikitin, 2022, p. 324). A. Brunel (1946) xebateke bi navê *Gulusar: Contes et Legendes du Kurdistan*, li Parîsê çap kirîye (Alakom, 2009, p. 162.).

Di serî da divê destnîşan bikin ku Şerefxan, di *Şerefnameyê* da cih daye hin efsaneyên ku li ser nijada gelê Kurd hatine gotin.

Pertev Naili Boratav (1973) *Yüz Soruda Türk Folkloru* da cih daye efsaneyên Kurdan ku li ser esl û nesla mirovan in. Wî di çar cihên vê pirtûka xwe da cih daye hîkayeyên Kurdan û ew bi navê wan ê eslî zikir kirine. Wî ew hîkayeya ku miletê Kurd pê tehl dibe jî bi awayekî zanistî û bêlayan dîyar kirîye (Boratav, 1999, p. 51).

Muhsine Yavuz (1989) û *Diyarbakir Efsaneleri* pirtûkek bi Tirkî amade kirîye û efsaneyên ku ji derdora bajarê Dîyarbekirê dane berhevkin li gor *Motif Index of Folk Literature* ya Stith Thompson ew nirxandine (Yavuz, 1989, p. 33). Çi heye ku ji bilî çend navên taybet ên Kurmancî, wê qet alîyên wan ên Kurdewar dîyar nekirine. Wekî ku metnên wan bi rastî bi zimanê Tirkî bin amade kirîye. Heta wê hin metnên menzûm jî wergerandine Tirkî.

Saim Sakaoglu (2008) bi navê *1001 Anadolu Efsanesi* pirtûkek çap kirîye û tê da efsaneyên derdora Bingol, Elazix, Erzirûm, Mêrdîn, Intab, Wan û Sêwazê jî hene (Sakaoglu, 2008); bes wî gişt bi zimanê Tirkî ew amade kirine û tu etfek bo Kurdîtîya wan nedaye.

Rezan Karakaş (2012) gotareke akademîk li ser efsaneyên têkildarî çem û çîyayên herêma Xerzan û Raman (Başûrê Batmanê û Kercewsê) weşandine (Karakaş, 2012, p. 1131). Wî di vê gotarê da ji efsaneyan zêdetir, şiroveyên wan derxistine pêş û ew bi bawerî û efsaneyên gelên dunyayê ra berawird kirine.

Koçerê Botan (1932) efsaneyêke Kurmancî bi navê “Mîr û Qund” di kovara *Hawarê* da weşandine (Botan, 1932, p. 205). Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl & Zîna Celîl (1989) xebateke bi navê *Çirok, Efsane û Rîwayetên Kurdî* bi zimanê Rûsî çap kirîye (Alakom, 2009, p. 163).

Remezhan Alan (1998) bi nivîsa xwe ya “Serwerê Teyran” cihekî taybet di dîroka lîteraturî ya efsaneyên Kurmancî da cih digire. Wî di vê xebata xwe da cih daye 4 efsaneyên têkildarî çûk û teyran ku ji herêma Sêrt, Mêrdîn, Siwêrek û Hekarîyê berhev kirine û ew nirxandine (Alan, 1998, p. 97). Fîkret Sûhrewerdî (1998) nivîseke dirêj bi navê “Cin û Pîrhevok” weşandîye û tê da cih daye çend efsaneyên li ser cin û pîrhevokan û li gor *Motif Index of Folk Literature* ya Stith Thompson ew nirxandine (Sûhrewerdî, 1998, p. 38). Bi qasî ku ji lîteratura vê qadê dîyar dibe, li Bakur ev gotareke giring e ku vekolerekî bi vî terzî nivîsîye.

Mehrdad Îzady, di pirtûka xwe ya *Bir El Kitabî Kürtler* da cih daye hin efsaneyên têkildarî Kurdan (Îzady, 2007, p. 419). Îshaq Tepe (2007) di pirtûka xwe ya *Apê Kal* da cih daye hin efsaneyên Kurmancî. Ayhan Yıldız di xebata xwe ya *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî* da cihekî taybet daye mijara efsaneyan û di pey hin agahîyan da mînakê jî efsaneyên Kurmancî yên devera Dêrsimê daye (Yıldız, 2017, p. 187).

Necat Keskin di xebata xwe ya *Folklor û Edebiyata Gelêrî* da gava wî behsa behsa vegotinên gelêrî yê edebîyata gel kirîye (Keskin, 2019, p. 172), cihekî taybet û berfireh daye mijara efsaneyan. Nivîskarî, di pey geryana giştî ya li lîteratura dunyayê da cih daye efsaneyêke Kurmancan. Nihat Oner di xebata xwe ya *Ji Binbîra Kurdistan Baweriyên Gelêrî* da cih daye 7 efsaneyên Kurmancî ku ji herêma Agirîyê berhev kirine (Oner, 2019, p. 97).

Zeyneb Yaş (2021) efsaneyêke bi navê “Mem Şivanê Mîrê Mirazan” ji gundê Eynberana Sêrtê berhev kirîye û di kovara *Folklorame* hejmara 9an da weşandîye.

Mehmet Öncü xebateke bi navê *Çîrokên Efsaneyî yên Kurdistan* amade kirîye û tê da 64 berhemên edebîyata devkî ya Kurmancî ku ji devê çavkanîyên zindî yê herêma Semsûrê berhev kirine bi cih kirine (Öncü, 2022). Çi heye wî ji alîyê cureyên edebî ve ew ji hev kategorîze nekirine û dîyar nekirîye bê ka kîjan ji wan efsane ne û kîjan çîrok in. Aram Gernas 3 efsaneyên herêma Dîyarbekirê di xebata xwe ya *Folklor û Civatê* da bi cih kirine (Gernas, 2022, p. 203).

Kenan Subaşı teblixeke bi navê *Pirnavîya Cureyên Vegêrana Gelêrî di Folklorê Kurdîyê da* pêşkêş kirîye û di wê xebatê da beşek li ser efsaneyan û lîteratura efsaneyê û xebatên li ser yê Kurdî ku di folklorê Kurdî da hatine kirin jî destnîşan kirine (Subaşı, 2022, p. 527).

Bedran Hîkmet di xebata xwe ya *Daneberhevîya Memê Alan û Mem û Zînê* da cihekî taybet daye mijara efsaneyan û li ser pênase û taybetmenîyên wan xebitîye (Hîkmet, 2023, p. 20); bes wî dor neanîye ser efsaneyên Kurmancî û mînak ji wan ra nedaye.

İpek Bozlar Balcı gotareke akademîk li ser dergîparkê bi zimanê Tirkî weşandîye û bi taybetî cih daye 10 efsaneyên Bakurê Rojavayê Xerzan (Balcı, 2024, p. 60). Vê vekolerê ev efsane ligel versiyonên wan hem ji sehayê hem jî ji çavkanîyên nivîskî wergirtine û dane.

Çawa ku ji lîteratura qadê xuya dibe xebatên li ser efsaneyên Kurmancî yê Bakur kêma in û bi taybetî yê li ser efsaneyên herêma Xerzan ku bi Kurmancî hatine kirin hîç naxuyên; bes hin gotarên akademîk bi zimanê Tirkî hene. Ev jî giringîya vê xebata me zêdetir dike. Di pey xwendin û nirxandina vê lîteraturê da êdî em dê danasîna giştî ya metnên efsaneyan vekolin. Lewra em dê ji qada wan a giştî daneyên pêwîst ku peywendîya wan ligel mijara eslî ya vê vekolînê heye li vir rêz bikin.

1. Pênaseya Efsaneyê

Kelîmeya “efsane” ku di “ferheng” a zimanê Farisî û Turkî da bi heman awayî tê bikaranîn (Kurmancî, 2012). Di edebîyata Erebi de ku ji çêşnê efsaneyê re “ustûre”, gelhejmarîya wê “esatîr” tê gotin, di wateya wan hîkayeyan de tê bikaranîn ku esil ji rastîya wan re tune (Huseyn, 2012/1434). Di zimanê Fransî da efsane “légende”, di zimanê Almanî da “sage” û “legende”, di zimanê Erebi da jî “meqîbe” hatiye gotin (Boratav, 1969, p. 106). Bêjeya “legende” ji bêjeya “legendus” a zimanê Latînî ketîye zimanên Rojavayîyan. Lewra di zimanê Îtalî da “leggende”, di zimanê Îspanyolî da “leyenda” û di zimanê Îngilîzî da “legend” e (Sakaoğlu, 1980, p. 4). Di ferhenga Kurdîya Kurmancî da carinan bi awayê “fesane” û “gotegot” carinan jî bi awayê “efsane” tê

bikaranîn (Farqînî, 2000). Di Dimilkî de jî heman kelîme, bi awayê “efsane” hatiye diyarkirin (Malmîsanîj, et al., 2009).

Li gor “wateya terîm”î ya edebî, efsane, ji wan vegêranan ra tê gotin ku ji gewdeyê giştî yê cureyên dirêj ê vegêranan qut dibin, alîyên xwe yên hunerî ji ser xwe davêjin, kes an jî rûdanan, tenê bi alîyên wan ên awarte derdbirin (Boratav, 1969, p. 106). Li gor pênaseya Birayên Grimm ên bi navê Jakop Ludwig Karl Grimm (1785-1863) û Wilhelm Grimm (1786-1859) efsane, ew cure hikaye ne ku li ser şexs, rûdan yaxud cihekî rasteqîne yê diyar yaxud xeyalî dihê derbirin (Sakaoğlu, 1980, p. 4). Efsane ew cure vegêranên kurt in ku di nerîta devkî da cih digirin, bi giştî ne li ser bingeha rasteqîniya objektîf hatine hûnandin û di bin banê xwe da alemên esrerengîz di hewênin (Seyidoğlu, 1997, p. 13). Efsane, ew hikayeyên zaf kevnar ên têkildarî şexsek, rûdanek yaxud cihekî ne ku di nav berhemên edebîyata anomîm a gel da cih digirin û bi rêya zimanî nîfş bi nîfş hatine neqilkirin (Yavuz, 1989, p. 13). Li gor ku Subaşî ji çavkanîyên Kurdî radigihîne di nav Kurdan da efsane, wekî çîrok, hikaye û mîtan hatiye binavkirin (Subaşî, 2022, p. 531). Ev rewşa ha ku heye, pêdivî bi standartbûneke ciddî dibîne.

Çeşnê efsaneyan, di nav çeşnên edebîyata devkî ya cîhanê de, di sedsala XX-em da êdî gihastîye karakterekî diyar; lêbelê di edebîyata Kurdî de, hîn jî rave û pênaseyeke zelal a berbiçav bala vekoleran nekişandiye. Çunkî di nav berhemên edebîyata devkî Kurdî da li ser çeşnê destan, çîrok, hikayeya gel û efsaneyê xebatên mezin xuya nabin. Hin hikaye hene ku efsane ne; lêbelê ji wan re destan tê gotin û hin hikayeyên gel hene ku ji wan re jî destan tê gotin.

2. Taybetmendiyên Efsaneyan

Wesfê pêşî yê efsaneyê ew e ku mijara wê, bawerî ye. Tiştên ku vegêrê/vegêra efsaneyê derdbire, wisan qebûl dike ku rast in û bi rastî jî qewimîne.” (Boratav, 1969, p. 106) Alîyên xasî bi efsaneyan ew in ku vegêranên derbareyê kes, cih û rûdanan da ne, wesfekî wan ê wisa heye ku vegêrên wan, dixwazin derbirînen xwe bi mirovan bidin bawerkirin. Bi piranî wesfekî derasayî yê kes û rûdanan heye. Ji bilî van taybetmendîyan, vegêrana wan kurt e û derbirîna wan bi zimanê gel e (Sakaoğlu, 1980, p. 6). Metnên efsaneyan bi giştî çend motîfan di vegêrana xwe da di hewênin. Ligel hêlên wan ên rasteqîneyî, çawa ku alîyên wan ên derasayî hene, alîyên wan ên pîrozwerî jî hene. Lewra peywendîya wan bi kesayetên dînî ra jî heye (Seyidoğlu, 1997, p. 13).

Çawa ku Suhrewerdî (1998) amaje pê kirîye du taybetmendiyên serekî û eslî yên metnên efsaneyan hene ku hem heqîqeta jîyanê qiset dîkin hem jî rûdanên fewqelade (anormal) ku di raborîyeke nêzîk da qewimîne derdibirin. Lewra ew bi vî awayê xwe yê ku raborîya wan nêz e, ji mîtan (mithos) cîya dibin. Çunkî rîtuêlên mîtan, di demeke wisan da qewimîne ku xumam li ser wan heye. Bi ser van da taybetîyeke cîyawaz a efsaneyan ew e ku metnên efsaneyan, mîna mîtan ne “mînak-model”ên zemanê destpêkê (ing. in illo teêpore) ne. Zemanê efsaneyan bi temamî ne zelal bin jî, dîsa mirov dikarin texmînekê bikin (Suhrewerdî, 1998, p. 40).

3. Mijara Efsaneyan

Rûdanek, keseke/kesekî dîrokî yaxud dînî yan jî cihekî diyar dibe ku bibe mijara efsaneyekê (Seyidoğlu, 1997, pp. 13-14). Çawa ku ji pênaseyên wê jî diyar dibe, jîyana

ruhbaber û heywanan, bi giştî mijara metnên vî cureyê edebî ye. Têkilîya çêbûna rawiran û hikayeyên efsaneyî, gelek zêde bi hev ra heye. Çeşnê efsaneyan metnên mîtolojîk in û alîyên wan ên “nepenî” hene. Jixwe ew berhemên çanda devkî ne. Ji ber balkêşîya xwe, ew bi lez û bez belavî nav civakan dibin; bawerî bi wan tê kirin. Mîna çeşnê çîrokan bi haydarî li wan tê guhdarîkirin û ew tîen hezkirin.

4. Feydeya Efsaneyan

Digel ku hin hikayeyên efsaneyî ji binhişê xewn û xeyalên gel derketine jî, tîpeke îdeal a mirovan raberî me dike. Bi ser de jî gel, bi hilberîn û derbirîna hikayeyên efsaneyî, xwestîye ku wate bide wan hebûnên derveyî xwe û bi awayekî ji awayan, tîrsa xwe ya li hemberî wan, bişkêne. Çawa ku R. Alan (1998) jî amaje pê dike dewlemendiya zimanê Kurdî jî di van metnên efsaneyan da hewandî ye (Alan, 1998, p. 98).

5. Dîrokçeya xebatên li ser Efsaneyan

Gava em çavkanîyên tîkildarî xebatên ku li ser efsaneyan hatine kirin dixwênin, dibînin ku serê ewil vekoleran dest bi berhevîkirin û polînkirina wan kirîye. Bi taybetî vekolerên Alman û peyra jî yê Fransî di vî biwarê da baş xebitîne. Li gor ku çavkanî (Sakaoğlu, 1980, p. 11) radigihînin xebatên li ser efsaneyan, berî salên 1800î gelek kêmbûne, lêbelê di serê sedsala XIX-em da zêde bûne. Bi taybetî xebatên vî serdemê bi Birayên Grimm ên bi navê Jakop Ludwig Karl Grimm (1785-1863) û Wilhelm Grimm (1786-1859) dest pê kirîye. Van her du birayan, li ser efsaneyên Alman lêkolîn kirine û xebatên xwe bi awayê 2 cildan di salên 1816-1818an da çap kirine. J. M. Thiele di salên 1818 û 1823an da koleksiyoneke efsaneyan a bi navê *Danimarks Folksagn* [Efsaneyên Danimarkîyan] neşir kirîye. George L. Gomme di sala 1890î da bi pirtûka xwe ya *The Hnad-Book of Folklore* xebatên tîkildarî efsaneyan ketine nav gur û geşîyê. Karl Wehrhan di sala 1908an da pirtûka xwe ya bi navê *Die Sage* ku bi temamî li ser efsaneyan bû pêşveçûneke mezin di biwarê efsaneyan da pêk anî. Wî di vî pirtûkê da cih daye vehûrînen efsaneyan û wî hem ew li gor herêmen wan ên cografî polîn kirine hem jî bîblîyografiyeke mukemmel amade kirîye. Gelnas û zanyarê zanista gel ê Frensî Arnold van Gennep (1917) pirtûkeke bi navê *La Formation des Légendes* nivîsiye û tê da cih daye awayê teşekkula efsaneyan û awayê belavbûna wan.

Di pey van xebatên ferdî û millî da li Ewrûpayê serdema vekolînen komî û nêvdewletî ji sala 1959an û pê ve dest pê kirîye. Bi taybetî zanyar (Sakaoğlu, 1980, p. 12) ji bo xebatên navbera salên 1959-1969an, Serdema Kongreyan dibêjin. Di van salan da 6 kongre hatine lidarxistin. Ji ber ku hejmara efsaneyên berhevkirî li Ewrûpayê gihaştibû bi deh hezaran û îstîfadekirina ji wan gelek zehmet bûbû, di van kongreyan da mijara serekî ya vekolînan, polînkirin wan bû. Lewra wan komeleyeke bi navê **International Society for Folk-Narrative Research** ava kirîye û di bin banê wê da li hev civîyane. Vê komeleyê kongreya xwe ya pêşî, di sala 1959an da li Kielê li dar xistiye û peyra li Kopenhagê berdewam kirîye. Komeleyê ew teblîxên vekoleran bi navê *Internationaler der Volkserzahlforscher in Kiel und Kopenhagen (19.8-29.8.1959), Vortrage und Referate* weşandiye. Kongreya Anvers (6-8 Eylûl 1962 û bi taybetî Kongreya Budapeşte (14-16 Cotmeh 1963) gelek zêde bi kêrî vekolerên efsaneyan hatiye. Êdî di polînkirina efsaneyan da pîvanên navneteweyî cihê xwe girtiye (Sührewerdî, 1998, p. 41). Zanyaran piştî ku di biwarê termînolojîyê da gotina xwe kirin yek, êdî wan dor anî ser biserûberkirina sistema polînkirinê. Wan wekî gavê pêşî, di pey

katalogên neteweyî da, katalogên navneteweyî jî dan ber xwe. Ji bo vê jî K. C. Peeters, ev pêşnîyaz pêşkêş kirine (Sakaoğlu, 1980, p. 13):

- Divê planeke navneteweyî ya ku repertuwara millî li ber çavan digire bihê amadekirin.
- Repertuwarên millî divê îlhez hebin.
- Di bin banê International Society for Folk-Narrative Research da divê ji bo her herêmeke millî, endamekî ku ji wê herêmê berpirsyar be bihê hilbijartin, bi alîkarîya wan endaman, komîsyonek bihê çêkirin û di bin çavdêrîya vê komîsyonê da repertuwara navneteweyî bihê temamkirin.

6. Polînkirina Efsaneyan

Di van kongre û komxebatan da pisporên qada efsaneyan giranîyeke mezin daye ser jihevderxistina çîrok (tr. masal) û efsaneyê. Herwiha wan cihekî berfireh jî daye tîp û motîfên navneteweyî yên efsaneyan û awayê amadekirina kataloga wan. Di vê mijarê da jî wan dîsa giranî û giringî da wan xebatan da ku pêşî katalogên herêmî, peyra jî katalogên navneteweyî amade bikin. Di van kongreyên navneteweyî yên efsaneyan da ku li Budapeşteyê dihatin lidarxistin, bi taybetî Charles Joisten dixwest berê bala vekoleran bikêşîne ser van xalan:

- Gelo em dikarin çi wekî efsane wergirin?
- Em dê wan ên ku me wekî efsane wergirtine, bi çi awayî polîn bikin?

Li ser bingeha biryara ku di Kongreya Anversê da hatibû dayîn, piranîya vekoleran, bi efsaneyên ku ji welatê xwe berhev kiribûn beşdarî kongreyê bûbûn. Serokê Kongreya Budapeşteyê Kurt Ranke, ji bo raporên ku di Kongreya Anversê da hatibûn amadekirin û wan nêrînên vekoleran ku di sê rojên kongreyê da pêşkêş kiribûn binirxîne, lîsteyeke komên serekî ku efsaneyan di asta navneteweyî da polîn bikin, komîteyeke taybet ji pisporan tayîn kiribû. Van koman jî ev polînkirin derxist pêş û kongreyê ew bi awayê yekîtiya bîr û rayan qebûl kir. Di vê polînkirinê da navê koma bi nimreya 5em Local Legendes; navê nimreya 6em Mythological and Demological Legendes bû. Awayê giştî yê vê polînkirinê li ser 4 komên serekî û binkomî ye (Seyidoğlu, 1997, p. 15):

I. Efsaneyên li ser afirandina dunyayê û dawîya wê (Xerabûna dunyayê)

II. Efsaneyên dîrokî û efsaneyên têkildarî dîroka medenîyetê

- a. Efsaneyên têkildarî cihê medenîyetê û yên li ser menşeya tiştan
- b. Efsaneyên li ser hin cihan
- c. Efsaneyên li ser dîroka dîbê (ing. prehistory) û zemanên ewil
- d. Efsaneyên li ser herb û felaketan
- e. Efsaneyên li ser kesên temayuzbûyî
- f. Efsaneyên li ser xerabûna sîstemekê

III. Efsaneyên li ser mexlûq û hêzên sersiruştî-derasayî (mîttîk)

- a. Qeder

- b. Mirin û mirî
- c. Cih û xeyaletên bêyom
- d. Rêûresma xeyaletan û herbên wan
- e. Îqameta li dunyaya din
- f. Cin, perî, ruh
- g. Xeyaletên têkildarî cihên medenîyetan
- h. Mewcûdên guherî
- i. Îblîs
- j. Ruhên xerab ku nexweşîyan bi xwe ra diênin
- k. Kesên ku ligel wan hêzên sersiruştî (sihir) heye
- l. Heywan û riwekên efsanewî (mythik)
- m. Xezîne

IV. Efsaneyên dînî / Efsaneyên têkildarî Xwedê û qaremanan

7. Çêbûna Metnên Efsaneyan

Ew rûdanên ku di efsaneyan de tên derbirîn, dibe ku carcaran xeyalî bin; lê belê ji van rûdanên xeyalî ra pirê caran esl û bingeş heye. Lewra serçavîya efsaneyan, rûdanên dîrokî ne. Çinku efsane, ji van rûdanên dîrokî derketine û bi derbasbûna demê ra, bawerîyên gelan jî ketine serê û tevî rûdana dîrokî, îca hin motifên awarte jî lê hatine zêdekirin. Carinan ev berhemên efsaneyî, bi hêmanên mîna cin, perî, dêw, hût û zîyayan hatine xemilandin. Bi vî awayî metnên efsaneyan, di nav her neteweyekê da, destan, çîrok û metelokên ecêb cihê xwe girtîye.

Efsane, çeşnekî giring ê kana edebîyata devkî ye. Her gel û miletekî efsane hene. Ev efsane, li ser rûdanên balkêş ên serdema xwe hatine derxistin. Bi xêra van efsaneyan dîroka gel, civak û neteweyan ronî dibe. Dîsa têkilîya jîyana ruhbabaran û heywanan bi van efsaneyan heye. Çeşnê efsaneyan hinekî mîtolojîk in, lewra alîyên wan ên nepenî û nihênî jî hene. Bi giştî ew berhemên devkî ne. Ji ber balkêşîya xwe, bi lez û bez belavî nav civakan dibin; bawerî bi wan tê kirin. Mîna çeşnê çîrokan, ew jî bi haydarî tene guhdarîkirin û hezkirin.

Ew rûdanên ku di efsaneyan de tên derbirîn, dibe ku carcaran xeyalî bin; lê belê ji van rûdanên xeyalî ra, pirê caran esl û bingeş heye. Lewre serçavîya efsaneyan, rûdanên dîrokî ne. Efsane, ji van rûdanên dîrokî derketine û bi derbasbûna demê re, bawerîyên gelan jî ketine serê û tevî rûdana dîrokî, îca hin motifên awarte jî lê hatine zêdekirin. Carinan ev berhemên efsaneyî, hêmanên mîna cin, perî, dêw, hût û zîyayan hatine xemilandin. Bi vî awayî, di nav her neteweyê de, destan, çîrok û metelokên ecêb cihê xwe girtîye. Piranîya efsaneyên ku di nava Kurdistan de tên derbirîn, li ser kesayetîyên mezin ên dînî û li ser cih û warên erdnîgarîyê ne.

8. Koça Efsaneyan

Çawa ku çîrok (tr. masal) ji cograyayekê derbasî cografyayeke din dibe û ji zimanekî derbasî zimanekî din dibe, metnên efsaneyan jî wisa koç dikin. Li gor ku em ji “teorîyên gelnasîyê (follorê)” têdigihîjin (Çobanoğlu, 2029, pp. 115-116), efsaneyên gelan, bi rêya bazirganan li nav welatên Rojhilat û Rojava digerin. Ji teorîyên serdema pêşî yên gelnasîyê, li gor zanyarê “teorîya koça çîrokan û deynkirina kulturî” Teodor

Benfey (1809-1881) ku rojhilatnas (ing. orientalist, tr. şarkiyatçı) e, wî *Kelîle û Dimne* wergerandîye zimanê Almanî û jê ra “pêşgotin”eke dirêj nivîsiye, di navbera çîrokên Ewrûpayî û gelên din da dirûvdarî û hevparî hene. Bi qenaeta wî çavkanîya serekî ya malzemeyên helbestkî û edebî yê Ewrûpîyan, Hindistan e. Efsaneyan, ji çî nivîskî çî jî devkî, ji Hindistanê koçî Îran, Erebiistan û Filistînê kirîye, ji wê derê jî ew bi rêya bazirganîya Deryaya Spî, derbasî Ewrûpayê bûne. Di vê koça efsaneyan, yaxud koça wan a ji kulturekê ya kultureke din da, ji gelên ku bi bazirganîyê ra mijûl in, roleke giring a Erebi û Mûsewîyan heye. Helbet ji bilî van nêrînan, bîr û rayên din jî di vê biwarê da hene; bes ji ber ku qewareya vê xebatê ranagire, em dirêjî nadin berfirehiya mijarê.

9. Şaxê Zanista Li Ser Efsaneyan

Di serdema me de, hin kesan xwestîye ku li ser temamê wan hikayeyên efsaneyî yê gelan, bi awayekî birêkûpêk, lê bikolin û bigihîjin encamekê. Bi derbasbûna demê re, ev karê lêkolîna li ser efsaneyan, gihaştîye merheleyeke zanistî.

10. Efsane û Edebîyata Devkî

Mîtos di destpêkê da bi dab û nerîta devkî hatine wergirtin. Li gor zanyaran edebîyata devkî berî ku mîrov bikaribin tirs û hêvîyên xwe derbasî nivîsê bikin hebûye. Lewra carinan mîtos, bi rêya nivîsê hatine tomarkirin û tesbîtîkirin. Mîtos ji bo folklor çîrokên folklorîk bûye mîna navendekê. Ji ber vê jî mîtos wekî destkeftîya herî bilind a edebîyata devkî hatîye hesibandin (Vali, 2022, pp. 29-30).

Ev hikayeyên efsaneyî ku berî dîrokê li ser serpêhatîyên bawerî, ayîn û lehengan hatine derbirîn, piştî ku demeke dirêj bi ser wan ra derbas bûye, bûne wekî metnan/tekstan. Ji van ra di edebîyatê da “*Metnên Mîtolojîk*” tê gotin. Civakê, hest, hesret, xeyal û pêbawerîyên xwe bi van metnan derbirîne. Dîroka gelan a berî dîrokê jî, bi xêra van metnan hindik be jî ronî bûye. Ev metnên mîtolojîk, heta “vedîtina nivîsê” bi awayê “devkî” mane (Yıldız, 2017, p. 187).

11. Metnên Mîtolojîk

Piraniya metnên mîtolojîk, li ser naskirina ji siruşt û afirînerê/xaliqê siruştê ne. Gelek neteweyên cîhanê, li ser ronîkirina van rûdanên ku bal û dêhna her kesî li ser wan bûye, ji xwe ra efsaneyên “afirandinê” derxistine. Îca di nav gelek gelên cîhanê da bi vî awayî ji efsaneyan jî, destanên xasî bi hest û xeyalên wî gelî çê bûne. Van metnên destanî, efsaneyî û mîtolojîk, bi xwe ra di nav gelan da edebîyatek çê kirîye. Ev edebîyat, “Edebîyata Devkî ya Gel” e. Di efsaneyê de, şêwazeke xasî bi wê tune, qayîdeyên qalibgirtî tune û bi zimanê rojane yê axaftinê tên derbirîn. Ew jî, cûreyekî derbirînê ye.” (Boratav, 1969, p. 106).

12. Peywendîya Efsaneyan bi Cûreyên Edebîyata Gel ra

12.1. Mît û Efsane

Alîyê herî nêz ê metnên mît û efsaneyan ew e ku vegêr û guhdar her du jî, wekî ku bi rastî jî qewimîbin bawer dikin. Jixwe vegêrê efsaneyê, gava wê derdibire, wekî ku bi rastî jî ew bûbe derdibire; lêbelê vegêrê mîtê, alîyê wê yê rastîyê, ji guhdaran ra dihêle. Tiştê ku heye ew “dem”a ku di efsaneyê da behsa wê dihê kirin, li ber dema ku di mîtan da behsa wê dihê kirin, gelek zêde nêzî îro ye. Heta teşekkula metnên efsaneyî di roja me da jî berdewam e; bes ji bo mîtan tiştêkî wisa tune. Herwiha ew cîhana ku

di mîtan da dihê derbirîn, cîhaneke dûrî cîhanên me ye; lêbelê cîhana efsaneyan, cîhana roja me ye. Bi giştî di hîkayeyên mîtan da qudsîyet û pîrozî heye; bes di efsaneyan da carinan pîrozî heye, carinan tune ye jî (Sakaoğlu, 1980, p. 21).

Di zimanê Yûnanî yê Berê da ji bo têgeha “peyv”ê sê bêje hatine zanîn. Yek jê “mythos” a din “epos” û a sêyem jî “logos” e. Mythos, ew peyv e ku yek wê dibêje, yaxud dihê bihîstin. Wan wê hingê bêjeya *mythos*, bi wateya *çîrok-metel*, hîkaye û efsaneyê bi kar anîye. Ji ber vê yekê Herodot ji mythosê ra dibêje ew *gotegot* in bi kêrî ilmê dîrokê nahên. Îca fîlozefekî mîna Platon, mythosê wekî wan metelokên beredayî ku dûrî rasteqîneyê ne pênase dike. Bêjeya duyem ku epos e, ew peyv e ku li gor pîr, pergal û pîvanekê dihê derbirîn û xwendin. Xwedê ev epos, wekî dîyarîyekê daye mirovan. Lewra hozanek peyvên xemilandî dide kêleka hev û guhdarên xwe bi wan dixê nav keşûhewayeke sihrîyane. Îca ev eposa ku wekî gotina hozanan dihê naskirin, bi vî awayê xwe, navên mîna helbest, destan û newayê wergirtîye û ji wê rojê heta îro, bi teşeyê epîk û epope di nav temamê zimanên Rojavayî da cihê xwe girtîye. Bi domana demê ra di navbera bêjeya mythos û eposê da hevgirtineke zexm pêk hatîye. Mythos naveroka wê gotina ku dihê gotin û wê hîkayeya ku dihê derbirîn be, epos jî ew teşeyê wê yê siruştî ye ku ketîye nav pîvan, xeml û hevsengîyê. Lewra *epos* çiqas xweşik û bedew be, *mythos* jî ewqas bedew û spehî dibe. Bi vî awayî efsaneyên zemanê ewil ên berê, gihaştine heta roja me, bi qernan jîyane û bûne xwedan wesfên navneteweyî (Erhat, 1989, p. 5).

Metnên efsaneyan, di nav pêvajoya serdem û dewrên dîrokî da teşe girtîye û hatîye; mît (ing. myth) metnên serdemên destpêkê ne û lewra serlehengên mîtan xwedawend û nîv-xwedawend in. Bi îzaheke din herçendî di efsaneyan da jî serlehengên awarte hene, bes ne yên destpêka demê ne. Lewra çêbûn û teşegirtina hîkayeyên efsaneyî hîn jî berdewam e, lêbelê metnên mîtan êdî çênabin. Ji ber van taybetmendîyan efsane, ji mîtan cîyawaz dibin (Seyidoğlu, 1997, p. 14).

12.2. Destan û Efsane

Taybetmendîyên hevpar ên destan û efsaneyan hene helbet. Di vegêrana van her du metnan da jî rûdanên awarte, kesên ku hêzeke raserî hêza mirovan pê ra heye cih digirin. Tiştê ku heye herçendî ev taybetmendîyên jorîn ji bo destanan mecbûrî ne, ji bo efsaneyan ne mecbûrî ne. Çunkî gelek efsane hene ku tu alîyekî wan ê derasayî tune ye. Jixwe gava rûdaneke dîrokî, tam bi awayê ku qewimîye nehatibe derbirîn, bes teşeyekî ku ji rasteqîniya xwe dûr ketibe girtibe, êdî ketîye nav teşeyê efsaneyê (Boratav, 1969, pp. 106-107).

Zanyarên edebîyata gel (Sakaoğlu, 1980, p. 108), herçendî wan rûdanên ku di efsane û destanan da qewimîne, wekî rûdanên rasteqîne dihesibênin jî, hin rûdanên ku di destanan da behsa wan hatîye kirin, carinan di pirtûkên dîrokê da jî qeydkirî ne. Îca ew rûdanên ku di efsaneyan da behsa wan dihê kirin, di pirtûkên dîrokê da gelek kê m in. Herwiha metnên destan û efsaneyan ji alîyê “dem”ê ve jî ji hev cuda ne. Çinku ew dema ku ji bo çêbûna metnên destanan pêwîst e, pêdivîya metnên efsaneyan bi pêvajoyeke wisa dûredirêj a çêbûn û teşegirtinê tune ye.

12.3. Çîrok û Efsane

Herçendî hinek efsane hene ku mijara wan û çîrokan eynî ye; bes di vegêrana çîrokan da cihê qewimîna rûdanan û dema wan di wextê vegêranê da nahê zanîn; bes di vegêrana efsaneyê da vegêr, ji bo ku guhdarên xwe bi wan bide bawerkirin, cih û dema rûdanê û nasnameya lehengan hîn zêdetir dide naskirin (Boratav, 1969, pp. 106-107). Ew dema ku di efsaneyê da rûdan tê da diqewimin, demeke nêzî serdema vegêr û guhdaran e, lêbelê ew dema çîrokê ku rûdan tê da qewimîne, demeke ne dîyar e. Mîna demê, çawa ku cihê rûdanên efsaneyan dîyar in, cihên rûdanên çîrokan ne dîyar in. Heta ji ber vê yekê, ji cihê rûdanên çîrokan ra “welatê çîrokan” dibêjin (Sakaoğlu, 1980, pp. 21-22). Bi tevî ku vegêr û mirovên guhdar, bi giştî dem, cih, rûdan û lehengên çîrokan wekî tiştên xeyalî ku kes nizane ew rêzerûdan kengê qewimîne, vegêr û guhdarên efsaneyan wan lehengên rûdanan û rêzerûdanan, dem, cih û kesên rûdanan wekî yên rasteqîne dizanin û bi wan bawer dikin (Yavuz, 1989, p. 9). Gava efsane di nava gel da dihê derbirîn, bi awayekî ku bi rastî jî qewimîbe, jê dihê bawerkirin; lê belê rûdan û kesên ku di çeşnê çîrokan de dihên derbirîn û salixdan, mîna ku xeyalî bin, bawerî bi wan nahê kirin. Heta yekcaran çîrokbêj, gava dikeve teswîrkirina rûdan û lehengên awarte, pê ra jî weha dibêje: *Ne min dîtîye; ne hûn bawer bikin*.

Bi tevî ku di hişê mirovan da çîrok, wekî mehsûlê xeyalî dihê qebûlkirin, metnên efsaneyan wekî tiştên rast û rasteqîne dihên qebûlkirin. Herwiha ew dema çîrokê ku rûdan tê da qewimîne, nahê zanîn; bes ew dema ku rûdanên efsaneyê tê da qewimîne nêzî zamanê me ye (Sakaoğlu, 1980, pp. 21-22). Di efsaneyê da kes, dem û cih dîyar e; lêbelê di çîrokê de ev cih, dem û şexs, ne dîyar in, xeyalî ne. Di efsaneyan da dîn û pîrozîya şexsan heye; lêbelê di çîrokan da ev tune ye. Hin çîrok hene ku li ser bingeha efsaneyekê ne; lê mirov dibêje qey efsane, nabe ku bi dirêjî bihête derbirîn, tim bi dema bihurî dihê derbirîn û mîna ku kurtebêjîya rûdanekê be dihê derbirîn. “Efsane, li ber çîrokan, ji alîyê dîrokî ve, bêhtir kevn in û li ser jîyana rojane ya mirovan, ji çîrokan zaftir bi tesîr in. Lewra alîyê dîrokî yê efsaneyan tune ye û bi vî awayê xwe, ji şaxê dîrokê vediqete.” (Yavuz, 1989, p. 4).

12.4. Menqîbe û Efsane

Efsaneyên dîrokîyane, wekî menqîbe derbasî edebîyata nivîskî bûne. Di bin banê efsaneyên menqîbeyî da çend cureyên dîyar hene. Hinek jê li ser cihên mîna gol û çîyayan in ku navên wan dîyar in, hinek li ser gund û bajaran, hinek li ser avahî û berhemên mîna dêr, mizgeft û piran, hinek li ser defneyên ku ji şexsîyetên dîrokî û mîletên berê mane, hinek li ser eslê netewe û hukumdaran, hinek li ser afatên mezin, hinek li ser kesên awarte ku xwedan hêza derasayî ne, hinek li ser herb û fetihan, hinek li ser serhildanên dijberî sisteman, hinek li ser kesên mîna zana, şair, şêx û murşîdên ku li nav û deng dane, hinek li ser evîndarên navdar û hinekî jî li ser kesên jêrtebeqeya civakî yên mîna şivan û ximzêtkaran in (Boratav, 1969, p. 110).

Ew berhemên bi navê “Tezkîreyên welîyan” ku behsa jîyanname û kerametên sofî û welîyên mezin dikin jî, dikevin nav koma efsaneyan. Hîn ji sedsala XIII-an ve berhemên bi navê Tezkîretu'l-Ewlîya ketine nav edebîyatê. Efsaneyên ku di van tezkîreyan da cih girtine, piştî demekê bi awayekî hinek guhertî derbasî nerîta devkî bûne û heta roja me hatine. Bi taybetî *Tezkîretu'l-Ewlîyaya Ferîduddîn Attar* ku di

sedsala XII-an da jîyaye di edebîyatê da navdar e û li zimanê Tirkî hatîye wergerandin. (Seyidoğlu, 1997, p. 15) Tiştê ku heye, ev xala nîqaşê ye jî.

12.5. Edebîyat û Efsane

Efsane, çeşnekî girîng e ji kana edebîyata devkî. Her gelekî efsane hene. Ev efsane, li ser rûdanên balkêş ên serdema xwe hatine derxistin. Bi xêra van efsaneyan dîroka gel, civak û neteweyan ronî dibe. Ji ber ku qewareya vê xebatê dest nade dirêjahîya vê binbeşê, em li vê derê derbasî efsaneyên Kurdan dibin.

13. Efsaneyên Kurmancî yên Devera Bakur-Rojavayê Xerzan

Piraniya efsaneyên ku di nava Kurdên herêma Xerzan da dihên derbirîn, li ser kesayetiyên mezin ên dîn û li ser çiyên erdnîgarîyê ne. Bi giştî ew li ser cih û warên mîna çîya, gelî, çem, keleh, pirdan in. Herwiha li ser kesên ku di nav gel da wekî welî dihên naskirin jî efsane-menqîbe hene.

13.1. Efsaneyên li ser Cih û Warên Siruştî

13.1.1. Çîyayê Mereto

Dibêjin ku zemanê ku Tûfana Hezretî Nuh Pêxember rabûye, gemîya wî hatîye ku biçe Çîyayê Cûdîyê, rêya wê bi ser Çîyayê Mereto ra diçû. Gava ku gemîya wî hatîye ser Çîyayê Mereto, Mereto di binê gemîyê da pê ra gerîyaye. Gemî çîqas çûye, çîya jî di bin wê da çûye û xwestîye ku gemî li serê bisekine. Hezretî Nuh¹ pê hisîyaye, jê ra gotîye:

“Mere to!”

Êdî ev çîya sekinîye, gemî çûye û êdî xelkê jê ra gotîye Çîyayê Mereto.²

13.1.2. Kanîya Mereto û Pez û Şivanê ku Bûye Kevir

Şivanekî koçer, havînê pezê xwe anîye binetara Çîyayê Mereto çêrandîye. Rojekê hem ew hem jî kerîyê pezê wî zaf tî bûye. Çi feyde li wan nêzan avek kanîyek tunebûye. Wî şivanî gotîye: “Ya Rebbî, eger tu avekê li van deran ji min û pezê min ra der bikî, ez ê beranekî ji Zîyareta Şêx Bazîdê Mereto ra bikim qurban.” Xwedê teala kanîyeke mezin di wir da der kirîye û vî şivanî tevî pezê xwe têr av xwarîye. Vî şivanî timatî kirîye û di dilê xwe da gotîye ka ez ê çawa beranekî bikim qurban û ji xwe ra gotîye: “Hema ez ê vê spîya ku li ser canê min digere bikim qurban.” Rabûye spîyek ji ser canê xwe girtîye û kuştîye gotîye: “Ha ji te ra qurban!” Xwedê teala di cih da wî û pezê wî gişt kirîye kevir. A niha mirov biçe wê derê, hîn jî ava wê kanîyê mîna ava aşekî zêde ye û diherike çemê binê xwe. Şivan li pêşîya wan e, kulavê wî lê ye û kerîyê pezê wî ku çil heb in, wisa tev bi awayê kevirbûyî xuya dibin.³

1. Di hin versiyonan da Çîyayê Mereto ji gemîya Hezretî Nuh ra gotîye: “Mere to”, (Dikarî bnr. Rezan Karakaş, gotara navbihurî)

2. Elîyê Resûl, 72 salî, cotkar, ji gundê Holêya Hezoyê ye, neçûye dibistanê, ji bav û kalên xwe bihîstîye. Me ev metin di sala 2002yan da li Holê berhev kirîye.

3. Zehra Erol, 83 salî, xanima malê, ji gundê Girêsora Sasonê ye, neçûye dibistanê, ji bav û kalên xwe bihîstîye. Me ev metin di sala 2024an da ji Holê berhev kirîye.

13.2. Efsaneyên li ser Dar û Riwekan

13.2.1. Sîsinên Mexerê

Gundê Holê, gundekî eşîra Bekiran e û nêzî Çemê Sasonê ye. Zemanekî li devera bi navê Mexerê, gelek dar û berên mîna berû (darên mazîyan), givîj, tehwi, givîjsork, helalok, bîyok û şekokan hebûn. Di nav darên xumpî da heywanên dirinde yên mîna hirc û guran jî dihewiyan. Gava bihar dihat, li rojhilatê vê deverê, li azîyeke berfireh miqdareke mezin ji nêrgizan hêşîn dibûn. Ji her aliyên herêmê mirov dihatin wê derê û xelkê dixwest wan berhev bikin, lêbelê pîr û îxtiyaran digot ku: “Di wextê xezaya sehabîyên Hezretî Muhammed Pêxember da, Hezretî ‘Elî bi hespê xwe yê Dundul hatiye vê derê û li hember gawiran şer kirîye. Ji ber xwîdana kihêla wî Dundul hatiye xwarê ev kulîkên Sîsîn (nêrgiz) hêşîn bûne. Şênîyên herêmê ji van nêrgizan ra dibêjin Sîsin.¹

13.2.2. Darika Hezretî Mî‘az

Dibêjin ku Pêxemberê Îslamê Hz. Muhammed ji bo herba li hember gawiran, bi tevî sehabîyên xwe hatiye aliyê Kûrana Xezaliyê. Ji wî ra cengawerên herbê lazîm bûne. Hatiye ji pîrejinekê jî kurê wê xwestiye. Kurê vê pîrikê, yekî bi tenê bûye. Ew jî bi xwestî bûye. Navê wî jî, Muazê Cembelî bûye. Gava Pêxemberê me ji pîrê daxwaziya kurê wê kiriye, pîrê jê re gotiye: “Ya Resûlê Xwedê, ez pîrikeke bi tenê me. Kilfetê min jî çûye rehmetê. Kurê min jî takî bi tenê ye. Ka ku tu rabî vî lawê min jî bibî, ez extiyara Xwedê çawan îdareya xwe dikim?” Resûlê Xwedê jî ji pîrê ra gotiye:

“Ya pîra hêja, ez ji te re soz didim ku ez ê destê te û lawê te, bi saxî bidim hev. Hema tu qet mereq meke.”

Dilê vê dayika pîr a reben xwe nade berê ku kurê xwe bişîne herbê. Jixwe karê daweta kurê xwe dike. Gunehê xwe bi xwe tîne û ji Hezretî Pêxember re wiha dibêje: “Ya roniya çavan, me jê ra keç xwestiye, Xwedê hez bike em ê roja hivdehê Adarê daweta wî bikin.” Nebiyê Xwedê, careke din soz dide pîrê ku lawê wê, bi saxî bîne bide wê. Axirkî pîrê razî dibe û Muazê wê jî pê ra bi rê dikeve. Ew jî digel sehabîyan, li hember gawiran, li nêzî Keleha Rebetê ku li aliyê çiyayê gundê Baqînê nêzî Sasonê ye, dikeve herbê û li binê dareke berûyan (mazîyan) şehîd dikeve. Piştî ku şer diqede, sehabî jî radibin şehîd û birîndarên xwe didin hev. Di nav şehîdan da Muaz jî heye. Gava Resûlê Xwedê çav pê dikeve, pîr mehzûn dibe. Radibe xwe pêjgurê Xwedê dike, dua dike: “Ya Rebbî, min soz da pîra diya Muaz ku ez bi saxî destê wan bidim hev û din. Va ye lawê wê şehîd ket. Ka ez ê bi çi rûyî herim hemberî wê. Ya Rebbî, tu bidî xatirê navê xwe, tu ruh bixî canê Muaz ku ez destê wî û dîya wî bi saxî bidim hev.” Tafilê duaya Cenabê Pêxember qebûl dibe. Xwedê teala ji nû ve ruh dixwe bedena Hezretî Muaz. Di vegerê da sehabî û Resûlê Xwedê, dihên ber derê mala Pîrê. Diya Muaz bi destê wî digire. Kêfa wê tê. Resûlê Xwedê dibêje: “Pîrê, binihêre çawan ku min soz dabû te, min destê we bi saxî da hev.” û xatir dixwaze diçe. Ew şev e ka çi ye bi ser wan de derbas dibe. Diya Muaz, bala xwe didê ku çi bibîne... Muaz birîndarekî xedar e û wisa bê ruh dirêj kirî ye. Êdî dêya wî ya pîr fam dike ku Muazê wê, di herbê de wefat kiriye. Hezretî

⁴ Elîyê Resûl, 72 salî, cotkar, ji gundê Holêya Hezoyê ye, neçûye dibistanê, ji bav û kalên xwe bihistiye. Me ev metin di sala 2002yan da li Holê berhev kirîye.

Pêxember pê dihise. Tê ber derê Dêya Pîr. Dêya Pîr ketiye şînê û digirî. Gunehê Nebiyê Xwedê pê tê. Radibe jê ra vî sozî dide:

“Ya diya Muaz, te yê ji kurê xwe ra salekê bi tenê, şevê û rojekê dawet bikira. Va ye ez li ummeta xwe wesiyet dikim ku her sal, çardeh, panzdeh, şazdeh û hivdehê adarê, werin vê dera ciyê ku Hezretî Muaz lê wefat kiriye û definkirî ye, daweta kurê te bikin. Ez jî bi te ra soz didim ku ez ê her sal, heta roja qiyametê, şeva Hivdehê Adarê, bêm ser meqbera lawê te.”

Her sal di 17ê meha Adarê da ji gund û navçeyên derdora Sason, Batman, Silîva û Pasûrê, ji mêran, jinan, ciwanan û zarokan xelk tê vê derê û mîna ku hatine dawetê, kêf û seyran dikin. Mêr hespan dibezînin, esnaf pil û pertan diênin difroşin, meydana ber zîyaretê dibe mîna fuarekê. Hinek dewrêş jî tîn ber meqbera Mu’az û li elbaneyê didin, beytan dibêjin û sofî dikevin helqeya zikir. Xelk li ser meqbera wî Qu’anê dixwînin. Dawet û karên zikrê şeva Hivdehê Adarê, bi giştî li *newaloka* ber meqbereyê dihê kirin. Şeva ku wê dotira rojê bibe Hivdehê Adarê, nîvê şevê ku êdî millet li ser ziyaretê hindik dibe, şev kerr dibe, tenê dengê Qu’an, zikir û elbaneyan dihê... Wan saetan, roniyek ji aliyê rojhilatê başûr/qibleyê ve tê, xwe berdide ser meqbera Hz. Muaz. Tê bawer kirin ku ev ronî, nûra Resûlê Xwedê ye. *Şeva Dewrê*, hin kes hene ku destê xwe jî hine dikin. Eynî mîna şeva hineya zavaî û bûkantiyê. Lewre Şeva Dewrê, dawiya ziyaretê ye. Heta wan salan jî li binê Keleha Rebetê darek hebû û xelkê jê ra digot “Dara Miaz”.¹

13.3 Efsaneyên li ser Avahîyên Mîmarî

13.3.1. Pira Malabadê û Pirekurtê

Zemanê ku hoste, şagirt û xebatkarên keviran dest bi çêkirina Pira Malabadê dikin, kevir ji wan ra lazim dibin. Serhosteyê pirê, şagiretekî xwe yê ciwan, bi tevî hin karkerên keviran şandîye alîyê herêma Xweşa ku keviran bînin. Ew çûne, çendakî li ser hev gelek kevir şandine ber destê hosteyê Pira Malabadê. Ev şagirtê ciwan, gava hatîye ser Çemê Batmanê, dîtîye ku li wî alîyê kevir hene, lêbelê av zêde ye û ew nikarin ji avê derbas bibin. Li ser vê, wî ji xebatkarên ber destê xwe ra gotîye: “Hûn hinek kevir ji min ra bînin, ez ê li ser vî çemî pirekê ava bikim da ku em karibin bi hêsayî bi ser da derbas bibin.” Xebatkarên jî bi gotina wî kirîye û kevir kişandine ber destê wî. Wî jî li ser cihekî teng ê ser çem ku her du alî jî teht in, pireke kurt lê kirîye. Hinek zeman pê dikeve, hosteyê wî yê mezin ku Pira Malabadê lê dike, mereq kirîye û ji wan kesên ku keviran dikîşînin ber destê wî pirsîye:

“Hûn îro çend roj in çî dikin? Hûn çima wisa bi derengî dikevin?”

Xebatkarekî jê ra gotîye: “Zemanê ku me kevir didan hev, çem derket pêşîya me. Şagirtê te, ji bo ku em karibin bi hêsayî bi ser da derbas bibin û keviran bînin, wekî derbasok, pireke kurt li ser ava çem ava kir, ji ber wê em hinekî bi derengî ketin.”

^{5.} Elîyê Resûl, 72 salî, cotkar, ji gundê Holêya Hezoyê ye, neçûye dibistanê, ji bav û kalên xwe bihîstîye. Me ev metin di sala 2002yan da li Holê berhev kirîye. Helbet versiyonên wê yên din jî li alîyê Farqînê hene. Ercanê Kemûkî jî di sala 2007an da ev ji me ra gotîye.

Li ser vê xeberê, serhoste mereq kirîye û çûye dîtina wê pirê. Gava çav pê ketîye, dîtîye ku wî şagirtê wî bi hostetîyeke ji wî çêtir ev pir çêkirîye. Di dilê xwe da gotîye ku wî di demeke evqas hindik da ev pira ecêb çêkirîye, ku bi bêhna fireh çêke ka wê çawa çêke. Xwedê zane ev ê ji min derbas bibe. Divê serê wî winda bikim. Lewra li ber wî xefikan çêdike. Rojekê gava bi hev ra dixebitin, hosteyê mezin wî ji ser pirê hêla kirîye avê û wî şagirtî wefat kirîye. Ev pira şagirt hîn jî ava ye û navê wê di nav xelkê da Pirekurtê ye.¹

13.3.2. Keleha Rebetê û Mirovê ku Bûye Kevir

Çîyayê Rebetê, dawîya dawî ya Başûrê Çîyayên Xerzan e ku li Deşta Batmanê dinihêre. Di nav wan rêzeçîyayan da cih digire ku ji alîyê Hezro, Pasûr (Kulp) û Sasûnê ku ber bi çîyayên Hezo û Bidlîsê ve dirêj dibin. Bi tevî ku li bakurê Çîyayê Rebetê gelek çîya li pey hev cih digirin û heta çîyayên Mûşê diçin, li başûrê wî çîyayî hîç tu çîyayek tune. Ev çîya gelek bilind e ku gava mirov ji gundên başûrê wî ve lê dinihêre, mirov dibêje qey digihîje esmanan. Ev gund ji navçeya Qubînê (Bişêrî) bajarê Batmanê, alîyê Mêrdîn û Farqînê ve xuya dibe. Li serê wî çîyayî, zemanekî gundekî Ermenîyan bi navê Rebetê hebûye. Yekî li ser wî çîyayî kelehek çêkirîye, derketîye ser kelehê û gotîye: “Ez ê destê xwe bilind kim, wê bigihîje Xwedê teala.” Li ser vê gotina wî, ew bûye keviyek û maye.²

13.4. Efsaneyên li ser Hebûnên Derasayî

13.4.1. Pîrelkên Newala Tehta[n]

Zemanê berê pîrelkan li cihên talde, xalî ku li ber avên newal û çeman bûn ji xwe ra mal çêdikirin. Newala Tehta jî, di navbera Mexerê ku di zemanê xwe da cihekî xump ê dar û beran bû û gundê Holê da dimêne. Gund li başûrê vê newalê ye û gundîyan serê biharê li ber ava vê newalê berav dikir. Li ber ava vê newalê, bi qasî 12 tehtên mezin hene û di navbera wan da jî hinek dar û berên mîna hêjîrokên tehtan, bizû û şengêl (kizwan) hene. Havînê jî gundîyan kerîyên pezê xwe dianî bin sîya wan. Di nav van tehtan da hinek jê qefayî ne û ji berê û berê ve bav û kalan digot ku ev der cihekî pîrelkan in. Gava dayîk diwelidin, ev pîrelk tên ku bebikên wan ji xwe ra bibin. Carinan jî hespên gundîyan dibin û li wan siwar dibin. Rojekê yek dibîne ku her sibeha Xwedê hespê wî zaf westîyayî ye û xwîdan daye. Wî ji xelkê pirsîye ka ev çi ye? Wan gotîye:

“Hebe tunebe pîrelk bi wextê şevê lê siwar dibe û wê dide xarê.”

Wî gotîye: “Ka ez çi bikim?”

Wan gotîye: “Bi xwe ra derzîyekê bigire û nobeta hespê xwe bigire, gava te dît ew hat, hema yekser vê derzîyê di pêsîra wê da bibe xwarê, ew ê bibe koleyê te.”

⁶ Elîyê Resûl, 72 salî, cotkar, ji gundê Holêya Hezoyê ye, neçûye dibistanê, ji bav û kalên xwe bihîstîye. Me ev metin di sala 2002yan da li Holê berhev kirîye. Helbet versiyonên wê yên din jî hene.

⁷ Yoldiza Rihanê, 77 salî, ji gundê Şabê ya Hezoyê ye, xanima malê ye, ji derdora xwesû û xezûranê xwe bihîstîye. Me ev metin di sala 2024an da li Holê berhev kirîye.

Wî jî wisa kirîye û ew girtîye û ji xwe ra bi qasî çend salakî kirîye xizmetkarê mala xwe. Zemanê ku Pîrelkê hevîrê malê dikir, bereketeke mezin diket teştê wan û girikên hevîr nediqediyan.¹

13.5. Efsaneyên li ser Zîyaretan

13.5.1. Şêx Mihemedê Şembekî û Tehtê bi Hingiv

Gora Şêx Mihemedê Şembekî, li hêla gundê bi navê Teraş e. Gundê Teraş, li ser bajarokê Sasonê ye. Teraş, ku mirov ji aliyê bajarê Batmanê ve diçe Sasonê, li milê çepê dikeve û li ber çem e. Navê din ê Şêx Mihemedê Şembekî, “Şêxbal e. Çemê ku ji aliyê çiyayê Mereto ve diherike tê, di ber vî gundî de tê. Li nav gelê herêmê baweriyeke wisan heye ku çi çaxê salê gava mirovek çi biçûk çi mezin be, ji aliyê jora gundê Teraş ve bê hemdî xwe bikeve ava çem û pê de here, bifetise jî nefetise jî, tê ji texma gora Şêx Mihemedê Şembekî derbas nabe. Li ser vî zatî kitêbên erebî agahî didin. Li gor agahiyeke, Şêx Mihemedê Şembekî, ji eşîrên bedewî yên ekra e. Navê Şêx Mihemedê Şembekî, ji rûdanekê bûye Şêxbal. Bêjeya “bal” bi Kurmancî “hingiv” e.

Li gor ku gundîyên Şêxbal û şênîyên gundê Teraş dîyar dikin, Şêx Mihemedê Şembekî, tevî keleşiyên xwe, ji aliyê Erebianê ve hatine vî gundî. Wê hingê jî, zordestiya eskerên hukûmata Tirkî hebûye. Esker hatiye vê derê û zor û zehmetî daye wî û mirîdên wî. Xelqê ku Şêx Mihemedê Şembekî nas kirine, çûne ba fermandarê esker û wan jê ra gotîye ku “Ev zat seyyîd e û xwedî keş û keramet e. bela xwe pê medin. An na dê bi xenîmê we be.”

Fermendar jî bawer nekiriye û gotîye:

“De ka ez ê çend kerametên jê bixwazim û tecrubeya wî bikim.”

Wextê salê jî çaxê zivistanê ye. Ji Şêx Mihemedê Şembekî ra bi zimanê Tirkî gotîye:

“Hele bize üzüm getir.”²

Şêx Mihemedê Şembekî tafîlê çûye jê ra tirî aniye.

Qasek bi şûn de îca fermandarê eskeran, jê daxwaza hingiv kirîye. Şêx Mihemedê Şembekî, tilîya xwe di kendalekî ra kirîye xwarê û hingiv jê nizilîye û wî ji wê derê hingiv daye wan. Fermandarê Tirkî, jê ra wê hingê gotîye “Şeyh Bal!”

Hê jî dilê fermandarê eskerîyê pê rehet nebûye, îca jê ra gotîye:

“Senin hanımın kendi elleriyle bize Pılor yemeği hazırlasın.”³

Şêx Mihemedê Şembekî dengê xwe nekirîye, ji jina xwe ra gotîye:

^{8.} Yoldiza Rihanê, 77 salî, ji gundê Şabê ya Hezoyê ye, xanima malê ye, ji derdora xwesû û xezûranê xwe bihîştîye. Me ev metin di sala 2024an da li Holê berhev kirîye.

^{9.} Ka ji me re tirî bîne.

^{10.} Bila jina te, bi destê xwe ji me re xwarina Pilorê çêke.

“Çê ke.”

Jina wî dest bi çêkirina Pilorê kirîye; lêbelê hêrs bûye û eniya wê, bê hemdî wê qermiçîye. Çawan gava ku bala Şêx Mihemedê Şembekî çûye ser made û mirûskê wê, hema bi yek carekê bi çengurê fermanîdar girtîye û heta Xwedê qewet didê, virvirandîye li nivê orta tehtekî daye perçiqandîye. Êdî ji wê rojê û vir ve, navê Şêx Mihemedê Şembekî, bûye Şêxbalê Kal. Îro jî gava mirov diçe ber wî tehtê ku Şêxbal hingiv jê deranîye, wisa cihê hingiv dîyar e ku heywan li serê datênin.¹

13.5.2. Zîyareta Şêx Bazîdê Mereto

Çîyayê Mereto, li piştî navçeya Sasonê, çîyayekî gelek bilind e ku hema hema bi ser temamê çîyayên dora xwe dikeve. Li wê derê zîyaretek bi navê Şêx Bazîd heye. Xelk dibêjin ku Şêx Bazîdê Mereto di xewna xwe da dîtîye ku wê dûpişkêk pê vede û ew ê pê bimire. Lewra ew li dunyayê gerîyaye ku cihekî bêdûpişk bibîne. Hatîye hatîye, dawî xwe li Çîyayê Mereto girtîye. Hatîye gihîştîye vê derê û gotîye êdî dûpişk nikarin xwe bigihînin min. Li wê derê pîrî ku westîyaye, hema li ser pîya ye û serê xwe danîye ser gopalê xwe û ketîye xewê. Dûpişkêk xwe bi gopalê wî ve kişandîye jorê, hatîye pê vedaye û ew pê mirîye. Lewra gava li kîjan alîyên nêzî vê herêmê ku dûpişk bi kê vede, wî derdixin cihekî bilind ku Çîyayê Mereto bibîne. Çawa derdikevin hafa Çîyayê Mereto, êşa wê disekine. Heta kî xwelîya Çîyayê Mereto bîne bixe hundirê mala xwe, mar û dûpişk nikarin bikevin mala wan.²

13.5.3. Zîyareta Şêx Xelîlê Baqirî û Darên Wî

Meqbera Şêx Xelîlê Baqerî di nav tixûbê gundê Xedîrê da dimîne. Xedîrê (tr. **Karaoğlak**) gundê Hezoyê (tr. Kozluk) ye û 11,13 km li alîyê başûrrojawayê Hezoyê; 1,73 km li hêla bakurê Xedîrê dikeve. Gava mirov ji alîyê Batmanê ve diçe, rêya zîyaretê di nav gundê Qawecî de ber bi milê rastê, bi alîyê qibleyê ve diçe. Ji zemanê berê ve bawerîyek di nav xelkê da heye ku gava mirov dest bide darên zîyaretê, bê guman dê zîyaret bi xenîmê mirovan bibe. Di vê biwarê da gelek menqîbe di nav gel da digerin. Kes nikare darên herêma zîyareta wî yên ku hişk bûne jî bigirin bibin mala xwe. Kî birîye, demildest di cih da poşman bûye. Bi tevî derdora zîyareta Şêx Xelîl hemû deşt e û zû bi zû darek bi ber çavên mirovan nakeve jî, darên şengêl û yên din li herêma wî gelek hene, pir mezin in û temenê wan zaf kevnar e. Rojekê yekî şivek ji dareke vê zîyaretê kirîye û pê barê xwe îşk kirîye (şidandîye) û gava xwestîye ku merkeba xwe bajo, kirîye nekirîye merkeba ji cihê xwe nelibitîye. Hevalên wî jê ra gotîye “Ji ber ku te dareke zîyaretê şikand ew naçe.” Wî jî ew darik çawa derxistîye, merkeba wî hereket kirîye. Şêx Xelîlê Baqerî di wextê xwe de gavan bûye. Gava wî heywanên xwe dibir wî alîyê ava çayê, darê xwe datanî ser avê, ji heywanan ra dibû pîr û heywan bi ser da derbas dibûn.³ Şêx Xelîlê

^{11.} Gulistan Korkmaz, 72 salî, nexwenda, ji bav û kalên xwe bihîstîye, bi eslê xwe ji Teraş e, ji nesla Şêxbal e, niha mala wan li gundê Halê ye. Me ev metin di sala 2002yan da li gundê Holê jê wergirt.

^{12.} Zehra Erol, 83 salî, xanima malê, ji gundê Girêsora Sasonê ye, neçûye dibistanê, ji bav û kalên xwe bihîstîye. Me ev metin di sala 2024an da ji Holê berhev kirîye.

^{13.} Hecî Fayîqê ‘Eyçirkê, ji gundê ‘Eyçirkê, 56 salî, neçûye dibistanê, pîşeya wî cotkarî ye. Wekî din ji gundê Qawecî jî hin pîr û kalan ev menqîbe neqil kirin.

Baqerî gava dar û ber dida hev û dikir piştî, bi gewdeyê marê reş girê dida û dianî malê. Piştî ku barê xwe dianî malê, wî mar berdida û mar diçû.¹

Encam

1. Di pêvajoya vekolînê da dîyar bû ku zanyarên dunyayê di pey vekolînên ferdî da, di navbera sala 1959an û 1969an, li Ewrûpayê li ser mijara efsaneyan şeş rêzekongre li dar xistine, di Kongreya Budapeşteyê da wan li ser polînkirineke hevbeş a navneteweyî ya efsaneyan li hev kirîye û di vê biwarê da biryarên hevpar dane. Li gor wan komên polînkirî yên efsaneyan, hinek jê têkildarî dîrokê ne, hinek têkildarî bîr û bawerî û mexlûqên dersiruştî ne. Çi heye ku vekolerên ku li ser efsaneyên Kurdan xebitîne, di van kongreyan da cih negirtine.
2. Hin vekolerên zanista gel ên Brîtanî, ji hin herêmên Kurmancîya Jorîn hin metnên efsaneyan berhev kirine û di gernameyên xwe da qeyd kirine. Hinekan tenê karê berhevkirina efsaneyên wan kirîye û hinekan jî li ser wan analîz kirine; bes efsaneyên ku ji herêma Xerzan hatine berhevkirin hindik in û bi qasî ku em di pêvajoya vekolîna xwe da bi ser ve vebûn, li ser efsaneyên vê herêmê tenê du xebatên zanistî di asta gotarêan da hatine kirin. Bi ser van da jî hin derdorên vekoler, hinek ji efsaneyên vê herêmê, bi neheqî kirine malê xwe û bi wî awayî di gotar û pirtûkan da bi zimanên derveyî Kurdî çap kirine.
3. Li herêma Bakur Rojavayê Xerzan ji ber wefata hin vegêrên pîr û kal ên efsaneyan, hinek hatine jibîrkin û hinek jê winda bûne çûne. Digel van jî li herêma Xerzan hin jî hin vegêrên efsaneyan hene û çend vekoleran hinek ji wan derbasî nivîsê kirine. Tiştê ku heye ev efsaneyên ku ji vê herêmê hatine berhevkirin, hemû bi zimanê Tirkî ne. Lewra giringîya vê xebata me zêdetir dibe.
4. Li gor van komên polînkirî yên efsaneyan, efsaneyên ku di vê xebatê da me li herêma Xerzan ew bi dest xistin, hinek jê têkildarî şexsiyetên dînî-dîrokî ne, hinek têkildarî cih û warên siruştî, çîya, kanî, avahîyên mîmarî, bîr û bawerîyên dînî, riwek û mexlûqên derasayî ne. Ji Efsaneyên li ser cih û warên siruştî 2 heb (Çîyayê Mereto û Kanîya Mereto), ji efsaneyên li ser dar û riwekan 3 heb, (Sîsin, Laleya stûxwar û Dara Mazî), ji efsaneyên li ser avahîyên mîmarî 2 heb (Keleha Rebetê û Pirekurtê), ji efsaneyên li ser zîyaretan 3 heb (Zîyareta Şêx Mihemedê Şembekî, Şêx Bazidê Mereto û Şêx Xelîlê Baqirî) û efsaneyek jî li ser hebûnên derasayî (Pîrelk) di vê xebatê da cih girtîye.
5. Di efsaneyên têkildarî cih û warên siruştî, riwek û zîyaretên şêxan da em bîr û bawerîyên dînê Îslamê û hinek jî dîrokê dibînin. Em di efsaneya li ser Şêx Mihemedê Şembekî da dibînin ku birêvebirekî zordar ê serdema berî bi 700 salî, bi zimanê Tirkî hatîye li Şêx Mihemedê Şembekî zilm kirîye û tûşî kerasetekê bûye. Di efsaneya têkildarî Sîsinê da jî em rastî dîroka Îslamê tên. Di efsaneyên têkildarî cihên mîmarî da jî dîsa em zanînen dîrokê dibînin. Çinku behsa hosteyên wan û awayê avakirina van cihên mîmarî dikin.

¹⁴. Mirovekî 66 salî ji gundê Qawecîya Hezoyê ev menqîbe li ser Zîyareta Şêx Xelîl, di sala 2023yan da ji me ra gotîye.

6. Di efsaneya mexlûqa derasayî “Pîrelk”ê da hînî wê bawerîyê dibin ku zemanê berê di nav gelê Kurd da ew bawerî hebûne ku mirovan karîye cin bi dest bixin, xwe ji zerarên wan biparêzin û wan bixin bin xizmeta xwe. Lewra em dibînin ku di efsaneyên herêma Xerzan da mirov rastî bîr, bawerî, dîrok û çanda gelê Kurd jî tê. Çi heye ku bi windabûna efsaneyan ra hin bîr û bawerîyên têkildarî dîn û dunyayê, agahîyên dîrokî û çandî yên civaka Kurmancan jî ji holê rabûne û hafizeya civakî ya herêmê zerar dîtîye.

Çavkanî

A. Çavkanîyên Nivîskî

- Alakom, R., 2009. *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*. 1 dü. İstanbul: Avesta.
- Alan, R., 1998. Serwerê Teyran. *War, hejmar 3*.
- Andranîk, 2009. *Dêrsim, Rêwîti û Erdnîgarî, (Wergera ji Ermenîya Kevin: Têmuê Xelîl)*. 1 dü. Diyarbekir: Weşanên Deng.
- Balcı, İ. B., 2024. Batman İli Efsaneleri. *Alman Dili ve Kültürü Araştırmaları Dergisi*, c. 6, Sayı 1 Haziran .
- Boratav, P. N., 1969. *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. 1 dü. İstanbul: Gerçek Yayınları.
- Boratav, P. N., 1999. *Yüz Soruda Türk Folkloru (İnanışlar, Töre ve Törenler, Oyunlar)*. 1 dü. İstanbul: K Kitaplığı.
- Botan, K., 1932. Mîr û Qund. *Hawar, hejmar 10*.
- Çobanoğlu, Ö., 2029. *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*. 10. Baskı dü. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Erhat, A., 1989. *Mitoloji Sözlüğü*. 1 dü. İstanbul: Rezmi Kitabevi.
- Farqînî, Z., 2000. *Büyük Türkçe-Kürtçe Sözlük*. 1 dü. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Gernas, A., 2022. *Foklor û Civat*. 1 dü. Ankara: Nûbihar.
- Hîkmet, B., 2023. *Danberheva Memê Alan û Mem û Zînê – Vekolîneke Folklorî*. 1 dü. Ankara: Weşanxaneya Lîs.
- Huseyn, E. R., 2012/1434. *Mu’cemu’n-Nefais el-Esasî, (Îşraf: Ehmed Ratib Ermûsî)*. 1 dü. Beyrût: Daru’n-Nefais.
- Îzady, M., 2007. *Bir El Kitabî Kürtler*. 1 dü. İstanbul: Doz Yayınları.
- Karakaş, R., 2012. Garzan ve Raman Yöresi Efsane ve Halk İnanışlarında Dağ ve Su Kültü. *Batman Üniversitesi Yaşam Bilimleri Dergisi*, c. 1, sayı 1, pp. 11-.
- Keskin, N., 2019. *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. 1 dü. İstanbul: Avesta.
- Kurmancî, K. K., 2012. *Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Farisî*. basım yeri bilinmiyor:yazarı bilinmiyor
- Lescot, R., 1941. “La Légende de Mir Mohammad”. (Weşana Nûdemê). *Hawar, hejmar 29*, p. 737.

- Malmîsanij, M., Uzun, M. & Espar, Î., 2009. *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî*. 1 dü. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Nikitin, B., 2022. *Kürtler Sosyolojik ve Tarihi İnceleme, (Çeviren: Cemal Süreya & Hüseyin Dernirhan)*,. 1 dü. Ankara: Özgürlük Yolu Vakfı Yayınları.
- Oner, N., 2019. *Ji Binbîra Kurdan Bawerîyên Gelêrî*. 1 dü. İstanbul: Weşanên Wardozê.
- Orbelî, Î. A., 2011. *Li Muksê Folklor û Jîyana Rojane, (Wergera ji Rûsî: Têmuê Xelîl)*. 1 dü. İstanbul: Nûbihar.
- Öncü, M., 2022. *Çîrokên Efsaneyî yê Kurdan*. 1 dü. İstanbul: Nûbihar.
- Sakaoğlu, S., 1980. *Anadolu-Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Notifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu*. 1 dü. Ankara: Kültür Bakanlığı Millî Folklor Araştırma Dairesi Yayınları.
- Sakaoğlu, S., 2008. *101 Anadolu Efsanesi*. 1 dü. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Seyidoğlu, B., 1997. *Erzurum Efsaneleri*. 1 dü. İstanbul: Erzurum Kitaplığı.
- Subaşı, K., 2022. Pirnavîya Cureyên Vegêrana Gelêrî û Nestandartbûna wan di Kurdîyê de. %1 içindeH. T. Tewfîq, dü. *Foklorê Kurdî*. Zaxo: Sentera Zaxo bo Vekolînên Kurdî.
- Sûhrewerdî, F., 1998. Cin û Pîrhevok. *War, hejmar 5-6*.
- Tarduş, İ., 2022. *İngiliz Seyyahların Gözüyle Ondokuzuncu Yüzyılda Kürtler*. 1 dü. İstanbul: Avesta.
- Vali, S., 2022. Mîtos, Mîtolojî û Edebîyat . %1 içindeS. V. & K. Subaşı, dü. *Mîtos û Edebîyat Mîtosên Kurdo-Îranî di Edebîyata Kurdî de*. İstanbul: Nûbihar.
- Yavuz, M. H., 1989. *Diyarbakır Efsaneleri Üzerine Bir Araştırma 1*. 1 dü. Ankara: San Matbaası.
- Yıldız, A., 2017. *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî 1*. 1 dü. İstanbul: Lorya.

B. Çavkanîyên Devkî-Zindî

- **KÇ1** Gulistan Korkmaz, 72 salî, nexwenda, gundê Teraş e, ji nesla Şêxbal e, niha mala wan li gundê Halê ye.
- **KÇ2** Zehra Erol, 83 salî, ji GirêSORA Sasonê, nexwenda
- **KÇ3** Hecî Fayîqê ‘Eynçirkê, ji gundê ‘Eynçirkê, 56 salî, neçûye dibistanê.
- **KÇ4** Elîyê Resûl, 72 salî, cotkar, ji gundê Holêya Hezoyê ye, neçûye dibistanê,
- **KÇ5** Yoldiza Rihanê, 77 salî, ji gundê Şabê ya Hezoyê ye, nexwenda.

The Disappearance of Some Memories, Beliefs, and Historical Information of the Garzan Kurmanji Tribes Due to the Loss of Their Legends

Abstract

Although there are many living legends in the Xerzan region, with the changing social conditions, the number of myth-tellers decreases over time and some of them disappear from the general memory of society. Just as there are few collection efforts in this region, there are also few scientific studies in this field. Therefore, scholars in the field are not well aware of the legends of this region and have not paid attention to their characteristics. It seems that this field has been neglected and there is a gap in it. There are some circles that take advantage of this gap and neglect and collect the legends of this region in an unethical way and make them their own as if they were not the property of Kurdish folk literature. For these problematic reasons, we found it necessary to start an academic study on this subject. Therefore, we have written about this dangerous, unknown and neglected state of the legends of this region as a research problem. In order to determine the characteristics and strength of the legends of the region, to determine their place in the memory and beliefs of the people of the region, to carry out their pollination according to scientific methods and to show their authenticity to the scientific world, we started this research. For this, first of all, we read and evaluated the general literature of the works of the nations of the world and the Kurdish works related to the field of legends. Then, we limited the universe of this study to the legends of the Upper Kurmanji of the West of the Xerzan region and collected legends from the population of the region, in an academic manner, from the mouths of the region's repatriates, as research data. We pollinated these collected legends according to the general method of the nations of the world, analyzed them according to the discovery stage, and highlighted their aspects that characterize the memory, beliefs, history and culture of the Kurds, and we reached the conclusion section. During the research process, it became clear that scientists around the world, following individual research, held six series of conferences on the subject of myths between 1959 and 1969. At the Budapest Congress, scientists agreed on a joint international classification of myths and made joint decisions in this regard.

Although researchers have collected and analyzed some myth texts from some regions of Upper Kurmanji using scientific methods, the legends collected from this region are few and there has been little scientific research on the legends of the Kherzan region. In addition, some research circles have unfairly appropriated some of the legends of this region, and some have disappeared due to the death of some of the narrators. Despite this, there are still legends in the Kherzan region. According to these pollinated groups of legends, some are related to history, while others are related to beliefs and supernatural creatures. In the legends of the Kherzan region, one comes across the memories, beliefs, history and culture of the Kurdish people. With the disappearance of legends, some of the beliefs and beliefs about the world, historical and cultural information of the Kurmanji community have also disappeared, and the social memory of the region has been damaged.

KeyWords: *Myths, Myth Groups, Memory And Belief in Myths, Upper Kurmanji Myths, Xerzan Myths.*